

**Dumahîk : Kurdistana Sor ....**

bo Axa biyanîyan berdidan canê hev û şer dikirin. Me berê jî dabû zanîn, li gor dûzena kevin, Kurdistana SOR di axa Azeriya de bû, lê di vê dema şer li 17'ê Gulana 92'an de paytext Laçîn dikeve destê Ermenîyan, her wisa ligel wê bajarên din yê di Kurdistana SOR de cihê xwe digirin weke Kelbecer, Kûbatlî, Zengîlan.

Heya Cotmeha 93'an dikevin bin desthilata Ermenîyan. Piştî ku Heremên Kurdistana Sor bi taybet Laçîn dikeve bin çavdêriya Ermeniya, nêzîkbûn û dostaniya Ermeniya tevî Kurdan taybetî li Soviyetê li nav hemû saziyên gelerî û ...hwd li Emenîstanê pêşketin. Wê demê Wekîl Mûstafayof

Fermandarekî kevin ê artêşa Sor ku dengyên herêmê û nasîyarê wî zêde bûn, yekser ev firsend bikar anî û wekî Serokê bizava azadiyê bi otobûsan, millet bire Laçînê û deklarasiyona Serxwebûna Kurdistana Qefqaziyayê eşkere kir û li 9-10 Hezîranê ev ji hemû cîhanê re dan zanîn. Ji wê demê virde ev deklarasyon li ser Kaxezê maye û tu hemelekî xwe jiyânî nine. Herwiha nezalalî jî di navbera Azerî û Ermenîyan de berdewam in û çî dibe bila bibe, lê du car avakirina Kurdistana Sor dîsa jî hêvî û bi xwe bawerbûnekê dide Kurdan. Komara Kurdistanê û Kurdistana Sor tîrojkek berbiçav û ronak a gelê kurd in.

**Rojnama Agirî - Hejmar 105, 15'ê Şibata 2009**

**Pêşmergeyekî Herî Kevnar Yê Komara Kurdistanê Koça Dawiyê Kir**

Mixabin roja îne, 6'ê Şibata 2009'an, **Ebdulqadir Debaxî**, naskirî bi **Mame Qale**, Pêşmergeyê herî kevnar yê Komara Kurdistanê û PDKÎ û herwiha endamê komeleya J-K, di temenê 88 saliyê de li bajarê Londonê çû ser dilovaniya xwe.

Mame Qale xebatkarekî mezin yê rêya serbestiya Kurdistanê, têkoşerekî mandînenas ê tevgera Kurdayetiyê û alîgirê wekheviya jin û û mêran bû. Wî nêzîk 70 salan li jiyana xwe di rêya azadiya Kurd û Kurdistanê de bihurand.

Nemir Mame Qale pirtûkek dewlemend li ser dîroka Komeleya Vejiyana Kurd nivîsiye ku çavkaniyek giring li ser J-K'ê tê hesabandin. Her wiha pirtûkek çîrokan

ya nivîskarê Navdar ên Îranî, Sadiq Hidayet kiriye Kurdî û her 2 hatine çapkirin. Çend destnivîsên wî bi cî mane ku çap nebûne. Sedan



gotar û lêkolînên wî di rojname û çapemeniyên tevgera rizgarîxwaziya Kurdistanê de hatine belavkirin.

Bi vê hencetê ve, Desteya Weşana Agirî, behî û sersaxiyê pêşkêşî endamên malbat û xizm û kesên wî nemirî û hemû xelkê Kurdistanê dike.

**Rojnama Agirî - Hejmar 105, 15'ê Şibata 2009**

**Bi Boneya Hatina Sersala Kurdî Û Cejna Netewî "NEWROZ" . Em Bi Navê Komîta Rêvebir Ya Belavoka Newrozê, Hemî Gelên Cîhanê Û Bi Taybetî Gelê Kurd Pîroz Dikin**